Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :746 24-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Vîrûsa korona Ji bo parastina jîngehê hişyariyek bû

Jîngehparêz û Mamosteyê Zanîngehê Dr. Salih Necîb, diyar kir ku vîrûsa korona weke diyardeyeke xwezayî peyda bûye û ji bo welatan dengeke ku xwezayê biparêzin û destdirêjiya mirovan a li ser jîngehê were bidawî kirin.
Jîngehparêz û Mamosteyê Zanîngehê Dr. Salih Necîb diyar kir ku qirêjbûna jîngehê bandoreke mezin li aboriya cîhanê û bilindbûna pileya germê kiriye û atmosfeteke bixeter e, lê vîrûsa korona weke dengekî hişyarkirina welatan e û ji hikûmetên welatan re got, sînorekê ji destdirêjiya li ser jîngehê re daynin.
Dr. Salih Necîb da xuyakirin ku xetera qirêjbûna jîngehê ji xetera korona xerabtir e. Lewre korona gefê li microvan temû dixwe, lê qirêjbûna jîngehê gefê li av, hewa, zîndî û aboriya cîhanê jî dixwe.
Salih Necîb got, divê plana




Herêma Kurdistanê ya piştî vîrûsa korona hebe û sînorekê ji bo zêdebûna wesait û palîngehan re daynin û sûdê ji enerjiya paqij bigire.
Jîngehparêz û Mamostayê Zanîngehê Dr. Salih Necîb da zanîn ku li Herêma Kurdistanê rojane nêzîkî 6 milyon lître sûtemenî tê şewitandin, herwiha ji bo yek milyon lître sûtemenî nêzîkî 2 milyon û 500 hezar kîlogram gaza karbondîoksît tevlî hewayê dibe. Herwiha ji bo yek lître gaz jî 13 hezar kîlogram gaza karbonmonoksît tevlî hewayê dibe ku gaza jehrî ye.

# Li Hesekê qonaxa 2. ya qedexeya derketina derve dest pê kir



Ji bo pêkanîna biryarnameya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li bajar, navçe û bajarokên kantona Hesekê, qonaxa 2. ya qedexeya derketina derve saet 06:00'ê 23ê Adarê dest pê kiriye.
Li herêma Cizîrê roja Yekşemê qonaxa yekê dest pê kiribû, li ser vî esasî çûnhatina nava bajar, bajarok û navçeyan qedexe bû, saziyên sivîl, dibistan, gerac, dezgehên veguhastinê û sînor tev hatin girtin.
Navendên tenduristiyê yên taybet û giştî, rêxistinên navdewletî, Xaca Sor, dermanxane, komîteyên dezenfekteyê, karkerên paqijkirinê, firin, firoşgehên pêwîstiyan, erebeyên veguhastina xwerek, şîrê zarokan û sehrîcên veguhastina sotemiyan nayên rawestandin.
Li bajêr kolan vala ne, dikan girtî ne, lê firin û daîreyên pêwîst e karên xwe bidomînin, vekirî ne.
Aliyên pêwendîdar bang li welatiyan kirin ku li gorî biryarên hatîn diyarkirin tev bigerin û kesên biryaran binpê bikin, wê rastî lêpirsînê werin.
Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê biryara qedexeya derketina derve heta demeke nediyar wê dewam bike.

# Belavkarê Rojnameya Yenî Yaşamê destegîr kirin



**Li Êlihê, polîsên Tirk bi ser mala belavkarê Rojnameya Yenî Yaşamê Serhat Bayik de girtin û destegîr kirin.**


Li Êlihê, polîsên Tirk serê sibê bi ser mala belavkarê Rojnameya Yenî Yaşamê Serhat Bayik de girtin û destegîr kirin. Polîsên dagîrker deriyê malê şkandin, di malê de lêgerîn kirin û dest danîn ser bîlgiseyara Bayik.

Bayik ku hinceta destegîrkirina wî nehat zanîn, birin Miduriyeta Polîsan a Êlihê.

# Hejmara kesên li Iraqê bi koronayê ketine bû 266

**Hejmara kesên li Iraqê bi vîrûsa koronayê ketine, gihîşt 266 kesan. Sîstanî jî bang li welatiyan kir da ku bi biryarên wezareta tenduristiyê ve girêdayî bin.**

Li gorî daxuyaniya Wezareta Tenduristiya Iraqê di nava 24 saetên borî de 33 kes li Iraqê bi vîrûsa koronayê ketine. Ji vane 22 kes li Herêma Kurdistanê ne. Hate gotin ku di nava vê demê de 3 kesên bi vîrûsa koronayê ketine jiyana xwe ji dest dane û 5 kes jî başbûne. Bi giştî 266 kes li Iraqê bi vîrûsa koronayê ketine. Wezaretê daxuyakirin ku bi giştî heya niha 23 kes mirine û 62 kes jî baş bûne.
Hêjayî gotinê ye di daxuyaniyê de behsa 9 kesên îro li Silêmaniyê baş bûne nehatiye kirin.
Rêberê Merciya Şîeyên Iraqê




Elî Sîstanî jî peyamek belavkir û got; "Roj bi roj hejmara kesên bi vîrûsa koronayê dikevin, zêde dibe. Ji bo vê pêwîste xelk girêdayî biryarên tenduristiyê bin. Di vê demê de bi ti awayek civînên bi kom ne rastin. Herwiha pêwîst nake kesek bi vîrûsê ketî, weke dijmin lê bê temaşe kirin."

## El-Eyûbî: Erdogan sûcên şer dike û ji bo neteweya Ereb xeter e

"*Serokkomarê* Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan berpirsê belavbûna kuştin û wêrana li bakurê Sûriyê û Lîbyayê ye." ***R-4***



## 'Netewa demokratîk yekîtiya gelan ava dike'

***Endamê*** Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Cuma Kalo got, "Fikrê neteweya demokratîk dijminiya ji aliyê deshilatdaran ve di nava gelan de hatî çandin, tine dike." ***R-4***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 746 24-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## HPG: Li Agiriyê 25 leşker hatin kuştin



Di çalakiya gerîlayên HPG û YJA Starê de li navçeya Bazîd a Agiriyê 25 leşkerên artêşa Tirk a dagîrker hatin kuştin. ***R-2***



## Ocalan: Zindiyê ne ekolojîk, nikare xwe ji tasfiyeyê xilas bike

» Peywira ku divê were bicihanîn ew e ku mirov bi avakirina civaka ekolojîk bersivê bide nêzîktêdayinên fetihkirin, tinekirin û dagîrkirinê yên kapîtalîzm û endûstrîyalîzmê.***R-6***



## Tecrûbeya me ya nû malê mirovayiyê tevê ye

» Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, diyar kir ku dîtina "Tecbûreya bi lez a dîtina vîrûsa Koronayê" malê mirovayiyê tevê ye û got, em amade ne destekê bidin welatên ku dixwazin vê tecrûbeyê bi dest bixin." ***R-6***


Kongreya Star

## Bi cidiyeteke mezin tedbîrên li dijî vîrûsa Korona pêk bînin

» Rêveberiya Kongreya Star bi daxuyaniyekê bang li welatiyan kir ku bi awayekî cidî nêzî hişyarî û perspektîfên Rêveberiya Bakûr û Rojhilatê Suriyê yên têkildarî vîrûsa Koronayê bibin.

# Pêkanîna Biryaran Erkê Her Kesî ye.

**Ji bo pêşîgirtina li belavbûna vîrûsa Koronayê, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û şaneya aloziyê gelek tedbîr girtin û 9 nuqteyên tenduristiyê amade kirin. Desteya Tenduristiyê jî da xuyakirin ku heta niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ti kes bi vîrûsê neketiye û bang li welatiyan kir ku hişyar bin.** *R-2*



# Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê 9 navendên tenduristiyê hatin vekirin

Ji bo pêşîgirtina li belavbûna vîrûsa Koronayê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û şaneya aloziyê gelek tedbîr girtin û 9 nuqteyên tenduristiyê amade kirin.



Navendên tenduristiyê li herêma Cizîrê, Kobanê, Reqa, Tebqa, Minbic û Dêrazorê hatin vekirin û niha alavên destpêkê tev li wan peyda dibin.
Desteya Tenduristiyê li bajar û navçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tîmên hawarxwestinê ava kirin. Tîm ji ambûlans, kadroyên tenduristiyê û bi cilûbergên meydanî pêk tê.
Herwiha reqemên rewşên awaret ku dema rewşên biguman derkevin yekser li wan bigerin, diyar kirin. Şaneya aloziyê 24 saetan bi nuqteyên tenduristiyê re di nava danûstandinan de ne.
Tîma serdegiritinê erkê wê ew e ku dema agahiyên derbarê hebûna vîrêsê de bigirin yekser destwerdanê bikin û wan rakin navendên tenduristiyê.
Bijîşk Mesûd Îbrahîm ku li navenda tenduristiyê dixebite diyar kir ku navend ji 3 ode, 7 text, 7 bijîşk û hemşîreyên perwerdekirî pêk tê.
Desteya Tenduristiyê da xuyakirin ku heta niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ti kes bi vîrûsê neketiye û bang li welatiyan kir ku hişyar bin. Kadroyên tenduristiyê rojane perspektîfan ji şaneya aloziyê û Desteya Tenduristiyê digirin.

## Dagîrkeran careke din av ji ser kantona Hesekê qut kir

Artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê yên 'Artêşa Wetenî ya Sûriyê' careke din av ji ser kantona Hesekê qut kirin.

24`ê Sibata derbasbûyî artêşa Tirk a dagîrker û çeteyan xebatkarên stasyonê derxistin û kar dan sekinandin. Lê piştî hefteyekê û piştî hevdîtinên di navbera Rûs û Tirkan de careke din stasyon xebitî.
Artêşa Tirk roja Şemiyê xebatkarên stasyona Elok derxistin û careke din av ji ser kantona Hesekê ku bi hezeran koçberên Serê Kaniyê û gundewarên wê qut kir.
Hevseroka Gerîndetiya Avê ya Kantona Hesekê Sozdar Ehmed ji ANHA'yê re wiha got: "Ji roja Şemiyê ve artêşa Tirk û çeteyên wê av ji ser şêniyên bajarê Hesekê û derdora wê qut kirine. Divê dewleta Rûsya ya garantor nehişta avê ji ser bajêr qut bikin. Lê erkê xwe pêk neanîn."
Sozdar Ehmed diyar kir ku girtina stasyonê karesatek e ku zêdetirî 1 milyon kesî bêav dimînin û wiha axivî: "Em heta niha nizanin ka çima stasyon hatiye sekinandin. 3 roj in çete nahêlin xebatkaran derbasî stasyonê bibin."
Sozdar da xuyakirin ku li gorî derfetên heyî dikarin avê bi stêran li şêniyan belav bikin, bîran bikolin û got gelek projeyên me hene, me dest bi




hina kiriye.
Stasyona Elok a staratîjîk avê dide bajarê Hesekê, navçeya Til Temir, herêmên başûrê Hesekê mîna Hol, El-Erîşa, Şedadê û Mergeda. Her wiha avê dide kampên li herêmê mîna kampa El-Erîşa, Hol û Waşokanî.

## HPG: Li Agiriyê 25 leşker hatin kuştin

Di çalakiya gerîlayên HPG û YJA Starê de li navçeya Bazîd a Agiriyê 25 leşkerên artêşa Tirk a dagîrker hatin kuştin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiya xwe ya li navçeya Bazîd a Agriyê de daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Daxuyaniya HPG'ê wiha ye:
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Serketina Şoreşgerî de ku li Eyaleta Serhedê didome, li dijî artêşa TC a dagîrker çalakî kirin. Di vê çarçoveyê de;
21'ê Adarê saet 09:45'an li ser riya qereqola Kozîlî ya navçeya Bazîdê ya Agriyê, hêzên me li wesaiteke zirxî ya Kîrpî reşandin. Wesait teqiya û bi temamî îmha bû. Li dijî yekîneyên dijmin ên ji bo destwerdanê hatîn cihê bûyerê, 2 çalakiyên sabotajê hatin kirin. Di encama van çalakiyan de 24 leşkerên dijmin hatin kuştin û gelek leşker jî birîndar bûn. Yekîneya me ya çalakî kirî, bi rengekî serkeftî li baregehên xwe vegeriya.



17'ê Adarê li dijî leşkerên li girê ewlekariyê yê qereqola Vedat Ozkaya ya li navçeya Bazîdê çalakiyek hate kirin. Di çalakiya sekvanî de leşkerek hate kuştin.
Li Amêdiyê jî 6 leşker hatin kuştin'
Fermandariya Yekîneya Tolhildanê ya Şehîd Bedran Gundikremo têkildarî çalakiya li dijî Qereqola Kanî Masî ev agahî parve kirin:
"19`ê Adarê Yekîneya Tolhildanê ya Şehîd Bedran Gundikremo li dijî Qereqola Kanî Masî ya artêşa TC'ê ya li navçeya Amêdiyê ya girêdayî Dihokê ya Başûrê Kurdistanê çalakiyek kir. Yekîneya me kon, çeper û kozikên li qereqolê kirin edef û di vê çalakiyê de 6 leşker hatin kuştin, 4 jî birîndar bûn.

## Angela Merkel ket karantînayê




Serokwezîra Almanyayê Angela Merkel, piştî ku deste wê li bijîşkekî ketibû, vîrûsa koronayê girt. Merkel ket karantînayê.

Derket holê, bijîşkê Merkel roja Înê dest dayiyê, bi vîrûsa koronayê ketiye.
Li gorî hikumeta Almanyayê Merkel bi lezûbez ketiye karantînayê.
Berdevkê hikumetê Steffen Seîbert diyar kir ku wê di rojên pêş de Merkel bikeve testê.
Seîbert da xuyakirin ku Merkel wê di karantînayê de jî xebata xwe bidomîne.

## Bi milyonan gul li Hollanda tên tinekirin

Yek ji welatên din ên ji ber vîrûsa nû ya Korona (Covîd-19) di warê aboriyê de gihîştiye nuqteya sekinînê Hollanda ye. Li vî welatî wû di sektora gulan de bi milyonan gulan tine bike.

Li gorî daxuyaniya ji aliyê kooperatîfa baxçevaniyê ya herî li pêş a welate Royel FloraHollanda ve hatî dayîn, li welat daxwaziyaa ji bo gulan ketiye asta herî jêr.
Berdevkê kooperatîfê Mîchel van Schîe ragihand ku neçar mene ji sedî 70-80'ê berhemên xwe tine bikin.
Vîrûsa Covîd-19 ku bû sedem pirên welatên Ewropayê bikevin karantînayê û rewşa îzalasyonê ketiye warê berfirehkirinê. Ji ber wê daxwaziya gulan kêm bûye, hilberîna gula pîvazê jî li benda 'encamekî diramatîk e.'





# Komîna Fîlm a Rojava mîrasa Yilmaz Gûney û Yekta Herekol e

Komîna Fîlm a Rojava di destpêka gavên sînemaya Kurdî de gavên xurt avêtin. Kêmîn bingehê sînameya Kurdî li Rojava datîne û dengê gelên herêmê bi riya sînameyê digihîne cîhanê.

Sînema, ango Hunera Heftan di çarçoveya pêşketina teknolojiyê de di destpêka serdema 19`an de ava bû. Dîroka dîtina navneteweyî ya amûrê pêşandana sînameyê digihîje 1895`an. Piştî wê Pîşeya Sînemayê pêş ket û heta roja me ya îro pêşketina wê dewam dike.
Destpêka rastî ya sînemaya Kurdî dema derhêner Yilmaz Gûney xelata Ringworm a mihrîcana Kanê 1982yan ji ber fîlmê xwe `Rê` digire, bû.

**SÎNEMA BERÎ ŞOREŞA ROJAVA**

Çewisandina li Rojava li ser gelê Kurd, bi awayekî neyînî bandor li warê hunera sînemayê kir. Ji ber wê mirov nikare behsa tecrûbeya sînemaya Rojava ya berî şoreşê bike. Herwiha çanda sînemayê bi giştî belav nebûbû. Ji bilî hin sînemayan li Qamişlo û Amûde salên 60 û 70`î de yên serdema borî. Holên sînemayê yên heyî jî hatin girtin yan jî kirin holên şahiyan.

**JI GUNDAN YEKEMÎN GAV HATIN AVÊTIN**

Girêdayî pêvajoya berî avakirina Komîna Fîlm a Rojava Şêro Hindî damezrînerê komînê wiha dibêje: "Berî ku tîma Komîna Fîlm navenda xwe veke, komek kesên ji sînemayê hes dikin serdana hinek gund û bajaran kirin, bi kesên ku berê têkiliya wan bi sînemayê re heyî nîqaş kirin. Piştre bi alîkariya sînemavanan ji beşên din ên Kurdistanê dest bi dewreyeke perwerdeyê ya mehekê kirin."

**AVAKIRINA KOMÎNA FÎLM A ROJAVA**

Komîna Fîlm a Rojava li bajarê Dirbêsiyê yê herêma Cizîrê 14`ê Tîrmeha 2015`an hat damezirandin. Pişt re navendên komînê li Efrîn, Kobanê, herî dawîn li Qamişlo hat vekirin.
Komîn ji sê beşan pêk tê; pêşendana fîlman û teşwîqkirina çanda sînemayê li Rojava, beşa perwerdeyê û beşeke taybet bi berhemkirina belgefîlman.
de lidar bixin. Da ku bibe yekemîn sînemaya li Rojava. Mihrîcan wê bi piştgiriya hinek saziyên têkildarî sînema lidar keve."
Komîna Fîlm hewl dide hinek fîlman mîna Stranbêjên Şingalê û Jin War bişînin mihrîcanên navneteweyî.
Her wiha amadekariyên sînaryoyên du fîlmên girêdayî êrişên Tirkiyê û nasnameyê.
Komîna Fîlm a Rojava bi koordîneya desteya perwerdeyê hewl dide sînema tev li materyalan bike. Tevî ku di havînê de bi piştgiriya mamosteyên ji derve, Rojava û Kurdistanê dewreyên perwerdeyê vebike da ku hejmara tîma Komîna Fîlm zêde bike.




## Seydayê Tîrêj...




Seydayê Tîrêj yek ji helbestvanên Kurd ên nûjen e ku mohra xwe li helbesta Kurdî xistiye û pirtûkxaneya wêjeyî ya Kurdî zengîn kiriye. Tevî siyaseta zordariya li ser Kurdan ya bi sedê salan, ziman û wêjeya xwe parastine û gelek wêjevan, nivîskar û helbestvan ji nava wan derketine.
Mele Nayîf Heso ku bi navê "Seydayê Tîrêj" tê naskirin, sala 1923yan li gundê Necmûk yê Qamişlo ji dayîk bûye. Seydayê Tîrêj pirtûkxaneya Kurdî bi helbestên xwe zengîn kir û mîrasekî çandî û wêjeyî li pey xwe hişt.
Di 6 saliya wî de malbata wî diçe gundê "Sê Mitkê Newaf" yê girêdayî bajarê Amûdê. Li wir li cem melayê gund "Mele Îbrahîm Gulî" fêrî xwendin û nivîsê dibe û Quranê ji ber dike. Herwiha zimanê Erebî û zanistên ola Îslamî dixwîne.
Sala 1937`an berê xwe dide Amûdê da xwendina xwe temam bike û li wir 5 salan dixwîne. Li wir gelek wêjevan, rewşenbîr û helbestvanên Kurd ên weke Cegerxwîn, Nûredîn Zaza, Hesen Heşyar, Qedrî Can û hwd.. nas dike. Ji wê demê ve dest bi nivîsa helbestan bi zimanê Kurdî dike.
Sala 1952yan helbestvan Seydayê Tîrêj tê girtin û dest datînin ser helberstên wî. Ji ber wê gelek helbestên wî wenda ne.
Helbestvan Seydayê Tîrêj di helbesetên xwe de ku mijarên civakî, neteweyî, evîn û xwazayê Kurdistanê dinirxîne, hevalê xwe Cegerxwîn dişopîne.
Helbestvan Seydayê Tîrêj bi sedan helbest nivîsîne û di 3 komhelbestên bi navên "Xelat, Zozan, Cûdî" de hatine komkirin. Hin destanên Kurdî kirine beytên helbestan. Weke destana "Siyabend û Xecê" û romana Sîpan û Perwînê.
Tîrêj di piraniya helbestên xwe de banga serhildanê û şikandina tirsê li ciwanên Kurd dike û helbestên li ser jinê jî nivîsîne.
Di rêwîtiya xwe ya wêjeyî de ku 79 salan dewam kiriye, li pey xwe mîraseke mezin ya çandê û bi hezaran dildarên helbestên wî yên taybetmendiya xwe ji xwazaya Kurdistanê ya çiyayî girtine, hişt.

## Komên şanoyên kurdî li ser medyaya civakî kom bûn

Komên şanoyên kurdî, diyar kirin ku ji ber koronayê wê hin lîstikan amade bikin û li ser medyaya civakî par ve bikin.
Wezareta Karê Navxweyî ya Tirkiyê, ji ber vîrûsa koronayê biryara girtina cafe, qehwexane, deverên şahiyê, navendên hûnerê û bi giştî deverên ku welatî lê kom dibin dabû. Ji ber wê komên şanoyan ku her meh ji bo lîstikan bername amade dikirin û dilîstin, mecbûr mabûn eywanên xwe bigirin.
Ji ber vê rewşê Şanoya Bajêr a Amedê da xuyakirin ku wê tevî hin komên şanoyê hin lîstikana amade bike û li ser medyaya civakiyî par ve bike. Wê 'Teatra Jiyana Nû', 'Şanoya Bajêr a Amedê', 'Tîyatro Mencelê' û 'Şanoya Yekta Hêvî' tevlî vê bernameyê bibin.
Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Wek komên Şanoya Kurd ên ku navên wan derbas dibin, em li ser medyaya civakî û televîzyonan amaderkariya bernameyek komediye dikin."

**'BI PÊNÛSA XWE BIBIN PERÇEYEK ŞANOYÊ'**

Di bangawaziyê de hat diyarkirin ku li benda skêçan in û wiha hat gotin: "Di vê projeyê de hûn ne wek temaşevan, di heman demê de hûn bi pênûsa xwe dikarin bibin parçeyeke vê projeye. Hûn dikarin fikir, raman û pêşniyarên xwe li ser medyaya civakî bigîhînin me."
Herwiha komên şanoyê diyar kirin ku paşê wê skeçûn hatîn şandin bên nirxandin û piştî nirxandinê ji bo skeçan budçeyek bê veqetandin.

## Cîhana bi maske



Medeni FERHO

Aktorê herka dîrokê aqilê mirov e. Dibêjin, lê, sîstema kapîtalist aqilê mirov dîl girtiye.
Endûstrîyalîzmê, li gel milîtarîzmê, burjuwazî û arîstokrasî, endûstrî, zanist û civak tev dîl girtine, qan
nên xwezayî berteref kirine, tez û antîtez li gorî xwe qaz kirine, baskên çandê, bi taybetî dîrok û sosyolojî kirine xizmeta îdeolojiya xwe.
Îdeolojiya kapîtalîzmê, ji nasname, nirx û pîroziyên insanî dûr e, mirovahiyê sêwî dike, bê binyat dike.
Di cîhaneke wilo de, her dem "maske" hene. Du maske ji bo me girting in: Maskeya durûtiyê û maskeya ku îro, ji bo vîrûsa korona ketiye rojeva mirovaniyê. Piştî gefa vîrûsa korona jî, cîhaneke bi maske derket holê.
Balkêş e; zanyarên cîhanê jî di nav de, feylesof, sosyalîst û komunîst, li ser maskeya durûtiya sîstemê ranewestin: Vîrûsa korona, encama vê durûtiyê ye û balê nakişînin ser "dabbetûl arz"a ku ahenga civakan xera dike!..
Dîrokzanê Israîlî Yuval Noah Hararî jî, nû nû dibêje; "Her cure hiyerarşiya civakî, têkiliya bi xwezayê re xera kirin, celebên mirîşkan derxistin holê."
Feyelesofê Slovanî Zîzek jî, ket lêgerîna "sosyalîzm û komunîzmê"... Ev derengmayîna li hemberî "kotik"a reş e.
Ocalan, berî 11 salan, bal kişandibû ser vê rewşê û got: "Sîstema kapîtalist, di cîhana xwezayî, ya mirovan, dar, geya û heywanan de wêraniyeke mezin kiriye. Vê jî, bandoreke wêranî li erdê, avê û atmosferê kiriye. Têkiliya di navbera ekolojî û sîstema kapîtalîst de îşareta SOSê dide."
Di dîrokê de, mînakên kabûsên siyaseta durû, zordestî, despotî, dîktatoriyan, gelek hene. Dehak, Firewn, hêzên artşên dagîrker, Mogolî, Napolyon û dewşirmeyên Îttîhadî û hwd. Mînak in û bûne vîrûsên kotikên reş.
Li Kurdistanê gotina "roma reş", tê wateya kotika bi destê dewşirmeyên Îttîhadî.
Riya herî kin û hêsan ya jiholêrakirina civak û gelan, bertereflkirina hişmendî, felsefe û zimanê wan e. Ev vîrûsa herî dijwar e û gefa herî mezin ya li dijî mirovahiyê ye; lê dema virûs, berê xwe nede qesrên sermayedaran û sîstema wan ya şelandin û talankirinê neke metirsînê, maskeya durûtiyê bi kar tînin, komkujiyan jî meşrû dikin.
Dema vîrûsa çeteyên Erdogan, ji bo Ewropa gef bû, qîr didan; lê, ji bo 8 bajarên li Kurdistanê, Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî, Şingal û Başûrê Kurdistanê bêdeng in.
Ev ne xeşîmiya ku Albert Camus di romana "weba" de behsa wê dikê ye. "Kesên li bajarê Cezayir Oranê, sibehekê rabûn ku li devê deriyê wan, mişkên mirî hene, pêça xwe nedane mişkên mirî û ev jî bû sedema kotikê." Ev kiryar ne xeşîmî ye, ne mişkên mirî, hêza ku aqil û îradeya gelan dîl girtine, bû vîrûsa kotikê. Sextekarên weke Rahîb Panaleux jî, wê bêjin; "kotika li Oranê, dana xwedayê mezin e, civakê dike binê ezmûnê."
Romana kiryarên Ittihadiyên dewşirme nehatiye nivîsandin, lê atlasê mêjiyên Kurdan, ne "metefora koran e", di stiran,çîrok û derbimeselan de wan kiryaran zindî dihêle. Ya giring, divê rewşenbiriya Kurd, nebin lehengên romana nivîskarê Portekîzî Jose Saramago û nebin qurbanên metefora korîtiya faşîzm dewşirme.
Vîrûsa korona jî, encama siyaseta durû ye, encama endûstriyalîzmê, encama zanista di destê sîstema kapitalist de dîl hatiye girtin e. Gelo, çete û lejyonerên Erdogan yên li Kurdistanê, li Suriye, li Libya, bi qasî vîrûsa korona ne metirsînî ne; ne îşareta SOSê ne? Gelo penaberên bi fermana Erdogan, wek celebên pez, birin ber sînoran, ne rûbirûhiştina komê penaberan bi kotika reş re ye?
Kabûsa global, vîrûsa korona jî, encama siyaseta durû ye.
Vîrûsa korona, derî girtin, lê dema vîrûsa faşîst êrîş dike, ligel mirovan, xanî û wargehan jî tine dike.
Slogana faşîzma dewşirme, "serî li ser bedenê, kevir li ser kevir nehêle" ye. Divê komên xelkê, civakên xwedî baweriyên cuda, yekîtiya xwe pêk bînin û li ber xwe bidin. Hingê wê bkarin, kozikên mirîşkan xera bikin, aqilê xwe, ku herka çemê dîrokê destnîşan dike, ji dîlgirtinê rizgar bikin, cîhan jî, wê ji maskeyan rizgar bibe.

# Desteya Tenduristiyê: Tecrûbeya me ya nû malê mirovayiyê tevê ye

Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, diyar kir ku dîtina "Tecbûreya bi lez a dîtina vîrûsa Koronayê" malê mirovayiyê tevê ye û got, em amade ne destekê bidin welatên ku dixwazin vê tecrûbeyê bi dest bixin."

Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê roja Şemiyê di civîneke çapemeniyê de ku li hola civînan li avayiya Daîreya Têkiliyên Derve ya li bajarê Qamişlo hatibû lidarxistin, ragihand ku tecrûbeya ku dikare nexweşiya vîrûsa Koronayê ya nû di 30 çirkeyan de bibîne dîtine. Û hat gotin, ev tecûrebe bi keda hevpar a Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û peymangeha PEAS a Swêdê pêk hatiye.
Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo pêşîgirtina li belavbûna Covid -19 di nava xebatê de ye. Her dawî desteyê serkeftineke li ser asta cîhanê bi dest xist ku nexweşiya vîrûsa Koronayê ya nû di 30 çirkeyan de dibîne.

### EV TEST LI SER 68 KESÊN LI WOHAN A ÇÎNÊ HATE ÇÊKIRIN

Tecbûreya Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hevkariya peymangeha PEASa Siwêdê bi dest xistî, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê desteyê ve li ser hin kesên biguman hat çêkirin û encamên baş dan. Herwiha peymangeha PEAS



ev tecrûbe şand bajarê Wohan ê Çînê û li ser 68 kesên virûs bi wan re heyî çêkir. Li gorî Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dr. Ciwan Mistefa tecrûbe ji sedî 85 encamên baş dane.
Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ciwan Mistefa diyar kir ku



tecrêbeya wan malê tevayiya mirovayiyê ye û ne ji bo bazirganiyê ye. Herwiha got, "pêwîstiya me di her alî de bi destekê heye ji bo ku em lêkolînên xwe pêş bixin û bixin xizmeta mirovayiyê."

# Salek di ser rizgarkirina Baxozê re derebas bû lê xetera DAIŞ hê heye

**EHMED MIHEMED-ANHA**



Berî niha bi salekê QSD'ê şkandina DAIŞ'ê li Baxozê ya gundewarê Dêrezorê ku baregeha dawî di destê wê de mabû ragihand. Pişt re pêngaveke nû ya têkoşîna li dijî DAIŞ'ê dest pê kir. Nîşanên derketîn isbat dikin ku xetera DAIŞ'ê digel hebûna zêdetirî 6 hezar endamên wê li girtîgehan û 19 hezar 225 malbatên wan di kampan de hê heye.
23yê Adara 2019'an Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi hevkariya Koalisyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê bi merasimeke girseyî li Heqil Umer ê bakurê rojhilatê Dêrezorê serkeftina leşkerî ya li dijî DAIŞ'ê li bajarokê Baxozê yê Dêrezorê ragihand ku devera dawî ya di destê DAIŞ'ê de mabû, ragihand.
Di daxuyaniya ragihandinê de Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdî gotibû: "Em ji raya giştî ya cîhanê re radighînin ku pêngaveke nû ya şerê li dijî terorîstên DAIŞ'ê dest pê dike, da hebûna leşkerî ya veşartî ya şaneyên wê bi temamî tine bikin ku xetera wê li ser herêmên me û cîhanê hê dewam dike."
Ebdî herwiha diyar kiribû ku QSD'ê 5 milyon kes, 52 hezar km2 ji xaka Sûriyê ji DAIŞ'ê rizgar kirine.
Lîderê çeteyên DAIŞ'ê Ebû Bekir El-Bexdadî dawiya Cotmeha 2019'an bi operasyoneke hevbeş ya QSD û Koalosyona Navneteweyî li gundewarê Idlibê hat kuştin.

### DAIŞ ÇAWA DERKET?

Dîroka derketina DAIŞ'ê li Iraqê vedigere sala 2003yan û dema Ebû Miseb El-Zerqawî rêxistina "Cîhad û Tewîd" Îlona 2003yan ava kirî.
Rêxistina behsa mijarê di gelek pêvajoyan re derbas bû heta "Dewleta Iraq a Islamî" sala 2006'an bi serkêşiya Ebû Umer El-Bexdadî hat ragihandin. Piştî kuştina Ebû Umer El-Bexdadî sala 2010'an Meclisa Şêwirî Ebû Bekir El-Bexdadî wek emîrê nû hilbijart.
Bi destpêka Bihara Erebî û belavbûna wê li Sûriyê re, El-Bexdadî ev wek fersendeke mezin dît ku derbasî Sûriyê bibe û ferman da çeteyên xwe yên li Sûriyê ku şaxekî rêxistina El-Qaîde lê ava bikin. Navê rêxistinê pişt re bû "Cebhet El-Nusra".
Piştî vê ragihandinê DAIŞê serê sala 2014'an dest bi dagîrkirina xaka Iraqê kir, Felûca, Remadî, Musil û Tekrît dagîr kirin. Sedê sala 2013'an bajarê Girê Spî yê Bakurê Sûriyê û 2014an Reqa, Eyn Îsa, Minbic, beşek ji Dêrezorê dagîr kirin. 15'ê Îlona 2014'an bere xwe da da Kobanê.

### LÎ KOBANÊ TÊK ÇÛ

Ji ber hovîtiya DAIŞê li Iraqê û hin derverên Sûriyê ti hêz li hemberî wê nesekinîn. Li Kobanê wê çêbû. Di encama berxwedana bêhempa ya şervanên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) ku 134 rojan dewam kir, cara DAIŞ şkest û yên mayîn ji Kobanê reviyan. Bi vê re rê li ber şkestina DAIŞ li Sûriyê û Iraqê vebû.
Bi avakirina Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) re li Bakur û Rojhilatê Sûriyê 10'ê Cotmeha 2015'an koalisyonê destek da vê hêzê. Lewre ya herî rêxistinkirî û li dijî DAIŞ'ê ya herî bi hêz bû.
Piştî Kobanê, avakirina QSD'ê nuqteya duyemîn a binkeftina DAIŞ'ê li Bakur û Rojihlatê Sûriyê ye. Ji dîroka damezirandina QSD'ê rêzeserkeftinên li dijî DAIŞ'ê ji Holê, heta Şedadê, Minbic, Tebqa, Dêrazorê û gundewarê bakurê bajarê Dêrazorê pêk hatin. Bajarokê Baxozê baregeha dawî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku di destê DAIŞ'ê de mabû, 23yê Adara 2019'an hat rizgarkirin.

# Ocalan: Zindiyê ne ekolojîk, nikare xwe ji tasfiyeyê xilas bike

Peywira ku divê were bicihanîn ew e ku mirov bi avakirina civaka ekolojîk bersivê bide nêzîktêdayinên fetihkirin, tinekirin û dagîrkirinê yên kapîtalîzm û endûstrîyalîzmê.
Serdestiya sinayî ya li ser ekonomiyê, ku moderníteya kapîtalîst li şoreşa sinayî bar kiriye, ne ku tenê bi rengê hegemonyatiyê pêk tê, li ser yekdestiya îdeolojîk û yekdestiya desthilatê jî têsîrên girîng dike. Bi gotineke dîtir, dema ku mirov qîma xwe pê bîne ku endûstrîyalîzmê bi wateya berteng weke mentiqa teknolojîk dahurîne, wê rê li ber wê veke ku mirov kapîtalîzmê bîne ser ekonomiyê. Fonksiyona ku kapîtalîzmê li endûstrîyalîzmê bar kiriye bi giştî hilweşandina civaka ekonomîk, bi taybetî jî hilweşandina civaka çandinî-gundîtiyê ye. Endustrîyalîzm di vê mijarê de bi rengê yekdestiya îdeolojîk û yekdestiya desthilatê sazkar e. Her ku civaka ekonomîk ji hev difeşkile, qanûna karê azamî ya kapîtalîzmê sazkar dike. Ev jî bi yekdestiya netew-dewletê re di nêv hev de geş dibe. Heta ku mirov dahurandina kapîtalîzmê li ser sê lingên moderníteyê neke, mirov nikare xwe jê dûr bigire ku li ser navê zanista sosyal di polîtîkaya pratîk de şaşiyên



sereke neke û rê li ber kêmasiye bigire.

### ZINDIYÊ NE EKOLOJÎK NIKARE XWE JI TASFIYEBÛNÊ XILAS BIKE

Endûstrîyalîzm bi gewherê xwe tê maneya ku rêgezên teorîk-pratîk ên fizîk, kimya û biyolojiyê li ser civakê, bi taybetî jî li ser avayiya wê ya aborî bi cih bîne. Ev jî bi xwe re redkirina sirûşta civakî tîne. Sirûşta civakî pergala ku tim li pey karê azamî ye nikare zêdetir ragire. Takekesîtiya kapîtalîst vê rasteqîniyê piştrast dike. Rêgezê sazkarbûna sirûşta civakî resen in. Bi rengê sinc û polîtîkayê sazkar dibe. Nêzîktêdayina endustrîyalîst zû yan jî dereng divê sazkarbûna sincî û polîtîk tasfiye bike. Ji bêkarî li nav ekonomiyê, ji krîz û jevcihêbûna dahatê berpirs e. Sedemên sereke yên ku ekolojiyê dizên, ji ber vê rasteqiniya endustrîyalîzmê tên, ku bi kurtasî hate pênasekirin. Civaka serdema endustrîyel, li tevayiya qadan bê geşkirina ekolojiya xwe nikare jiyana xwe bidomîne.

## Yekîtiya Karmendên Kurd a li Ewropayê banga hevgirtinê kir

Yekîtiya Karnebdên Kurd a li Ewropayê (AKEE) ji bo koronavîrûsê bi daxuyaniyeke nivîskî banga hevgirtinê kir.
Di daxuyaniyê de ev xal hatin diyarkirin:
"Me AKEE biryar da ku ji bo demekê giraniya xebata xwe bidin ser derfetên alîkariyê û ji endamên xwe re bibin rêber.
Di vê dema zehmet de divê em bibin stûna şîrketên endamên xwe.
Emê endamên xwe derbarê koronayê de agahdar bikin û dema qanûnên aborî yên Elmanyayê werin guhertin emê endamên xwe serwext bikin.
Emê piştgiriyê bidin tevayiya endamên xwe û emê li riyên çareseriyê bigerin.



# Jinên Dêrazorê bi rêxistibûnê dibin hêz

Ev bû salek ku QSD'ê gundewarên rojhilatê Dêrazorê ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirine. Piştî şkandina DAIŞ jinên herêmê bi rêxistinê dibin hêza sereke ya civakê.

Jin, li rojhilatê gundewarên Dêrazorê, ji ber êrîşên çeteyên DAIŞ`ê yên salên 2014-2019an, gelek êş û zehmetî kişandin. Çeteyan, lixwekirina cilên reş bi ser wan de disepandin û nedihiştin bêzilam ji malê derkevin.
Piştî ku herêm ji DAIŞ'ê hat rizgarkirin jinan xwe birêxistin kir û bûn hêza sereke ya civakê.
Endama rêveber a Komîteya Jinan a bajarê Hecînê Nûr Sultan, derbarê mijarê de wiha axivî: "Rola jinan di dema DAIŞ`ê de qels bû û hema hema tine dihatin hesibandin. Gelek zehmet bû ku jin li derveyî sînorên mala xwe kar bike. Lê niha xwe birêxistin kirine û bûne hêz. Jinan di heman demê de di saziyên Rêveberiya Xweser de jî cih girt. Ji tecrûbeyên jinûn li herêmên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê sûd girtin."
Nûr Sultan wiha axaftina xwe wiha domand: "Piştî rizgarkirina herêmê Rêveberiya Xweser derî li pêşiya jinê vebû ku kar bike û pişta xwe bide hêza xwe ya cewherî. Destpêkê me sazî û meclis ava kirin. Her ku dem derbas bû tevlêbûna jinan jî zêdetir bû. Bi destpêkirina avakirina meclisên sivîl û saziyan, jinê dest bi kar kir. Êdî di meclis û saziyan de ji bo jinê cihekî taybet yê karûbarên wê çêbûye.
Nûr Sultan got, ya bala mirov dikişîne rêjeya bilind a tevlîbûna jinan di saziyên mîna şaredarî, perwerde, tenduristî, siyaset û di Hêzên Ewlekariya Hundir de. Li gorî berpirsên wan saziyan rêjeya tevlîbûna jinan gihîştiye ji sedî 50î.
Tevî wê jî saziyên jinan yên taybet hene. li Dêrazorê meclisên jin û komîteyên jin ên ku li her bajarokek û navçeyek rojhilatê gundewarên Dêrazorê kar dikin hatine avakirin.
Hevseroka Meclisa Herêmî ya bajarê Hecînê Ayde Colan jî diyar kir ku herî zêde jinên ku hevjînên wan şehîd bûne û barê



malbatê hemû ketiye ser milê wan, zehmetiyan dikişînin. Colan got: "Ev rêje pir bilind e, digihêje ji sedî 80'yî. Ji bo ku bikarin zarokên xwe xwedî bikin, pêwîstî bi projeyên aborî heye."

# Kongreya Star: Bi cidiyeteke mezin tedbîrên li dijî vîrûsa Korona pêk bînin

Rêveberiya Kongreya Star bi daxuyaniyekê bang li welatiyan kir ku bi awayekî cidî nêzî hişyarî û perspektîfên Rêveberiya Bakûr û Rojhilatê Suriyê yên têkildarî vîrûsa Koronayê bibin.

**Di daxuyaniyê de wiha hat gotin:**

"Vîrûsa korona (covîd-19) ku hatiye asteke wisa ku mirovayiyê tehdît dike, weke tê zanîn destpêkê di dawiya meha Kanûn´ê ya 2019´an de li bajarê Çînê Wuhanê hat dîtin û roj bi roj bileztir belav dibe. Rojane jimara kesên ji ber vê nexweşiyê jiyana xwe ji dest didin zêde dibe. Eger destpêkê vîrûsa korona li dinyayê cîdî bihata girtin û bi taybetî jî pêşî li belavbûna wê bihata girtin wê rewşeke wiha dernaketibûya. Herwiha eger di warê belavbûna nexweşiyê de civak bihata agahdarkirin, bi tevlîbûn û piştgiriya civakê mûmkin bû pêşî li vê rewşê were girtin.

Ji bo em pêşî li nexweşiyê bigirin divê berî her tiştî em van pêk bînin:
* Her biryara hatî girtin divê em weke biryara xwe bibînin û li gorî wê tevbigerin.
* Ji bo paqijiya hewaya malê, divê pencereyên malan werin vekirin.
* Tevî paqijiya malê ya giştî, cihên ku zêde tên bikaranîn (destikê deriyan, destşo, serşok hwd.) baş werin paqijkirin.
* Pîr û kal û kesên xwedî nexweşiya domdar ku li hemberî vîrûsê destpêkê di xeterê de ne divê dernekevin derve û bi tecrîda civakî xwe biparêzin.
* Ji bo pêkanîna pêdiviyên jiyanî divê herî zêde kesek derkeve derve.
* Berhemên heywanan yên xav û baş nepijiyayîn divê neyên xwarin.
* Di paqijiya şexsî de divê dest bi ava germ û sabûnê baş werin şûştin.
* Divê fêkî û şînayî bi ava zêde baş werin şûştin.
* Ji bo tendûristiyê divê av pir were vexwarin, fêkî û şînayî were xwarin.
* Divê be nîvîsa doktor ti derman neyên bikaranîn û di rewşeke biguman de navendên tendûrîstiyê werin agahdarkirin.
* Di dema koxik û bêhnijînê de divê dev bi destmalê were girtin û destmal careke din neyê bikaranîn.
* Heta ji dest were destê xwe nedin çav û devê xwe.
* Divê li cihê qelabalix zêde sekin çênebe."

# Cihê îşkencekirina jinên êzidî kirin Meclisa Jinan

Jinên bajarokê Hecînê daxwaz kirin ku cihên DAIŞ`ê tê de îşkence li jinan dikir, bibin cihên piştgirî û xurtkirina jinan. Girtîgeha ku jinên êzidî yên hatibûn revandin û lê dihatin girtin, kirin cihê Meclisa Jinan a bajarokê Hecînê.
Çeteyên DAIŞ'ê li dijî gelên Sûriyê û Iraqê gelek sûcên mirovî pêk anîn. Herî zêde jî gel û jinên êzidî rastî revandin, îşkence û qirkirinê hatin. Çeteyên DAIŞ'ê jinên êzidî yên ku revandin, veguhestin Sûriyê û li girtîgehên li herêmên bejahiya rojhilatê Dêrazorê bi cih kirin. Yek ji van cihan jî bajarokê Hecînê bû. Paşê ew ji wir veguhestin herêmên Sûriyê yên di bin serweriya wan de. Çeteyan jinên girtî li bazaran difirotin û qetil dikirin.
Li jinan lixwekirina çarşefan dihat ferzkirin û destûr nedihat dayîn ku jin bi tena xwe ji malê derkevin. Lê jin niha, li bajarokê Hecînê cihê xwe di nava komîn, meclis û saziyan de digirin û beşdarî avakirina herêmê dibin.
Ji saziyên ku li bajarokê Hecînê hatine vekirin, yek jî Meclisa Jinan e. Tişta balkêş ew e ku jinên li Hecînê cihên ku DAIŞ`ê lê îşkence li jinan dikir, kirin cihên meclisên xwe.
Tê zanîn ku avahiya meclisê dema DAIŞ`ê herêm dagir kiribû, jinên êzidî yên ku ji Şengalê revandibûn, lê digirtin.
Jina bi navê Fatima Salim ku niha endama Meclisa Jinan a bajarokê Hecînê ye, wiha dibêje "Ev der cihê bindestkirina jinan û tunekirina mafên wan bû, lê îro bi serbilindî veguherî navenda Meclisa Jinan û mafên jinan bi dest dixin. Meclisa Jinan perwerdeyên bîrdozî, perwerdeyên hemşîretiyê û fêrkirina xwendin û nivîsandinê vedikin."

# Jin bingeha avakirina civaka gundan e



Bi ruhê jiyana komînal jinên gundan ji bo pêşketina kar û xebata çandiniyê alîkariya hev dikin û dibêjin, em bi kar û xebata çandiniyê pêşiya belengaziyê digirin.
Di civaka xwezayî de jinê çandinî pêş xist û civak bi rê ve dibir. Lê piştî derketina tebeqeyan sîstemên desthilatdar civak belav kir û bi avakirina bajaran çanda çandiniyê kêm bû. Lê çanda civaka xwezayî di kesayeta jinên li gundan de zindî ye û ji bo pêşketina çandiniyê di nava kar û xebatê de ye.
Li gundê Til Sexirê yê bajarê Hesekê, jina bi navê Ayşe Îsa (42) diyar kir ku parastina xebata çandiniyê girîng e û wiha axivî: "Ez dayîka 4 zarokan im, hevjînê min jî astengdar e. Em bi çandiniyê û xwedîkirina sewalan, debara xwe dikin. Em pir ji karê xwe hes dikin. Jin bi xwezayê ve girêdayî ye, lewre xweza û jin her du jî afrîner in."

### 'JİYANA KOMÎNAL Dİ JİYANA GUNDAN DE ZİNDÎ YE'

Ayşeyê behsa ruhê civakê kir û wiha got: "Li gundan jin bi ruhê jiyana komînal alkariya hev dikin. Ya ku jiyana gundan xweş û geş dike jiyana civakî ye ku her kes alîkariyê dide hev."
Jina bi navê Xeyriya Ehmed jî wiha axivî: "Jin bingeha avakirina civakeke saxleme. Kar ne jê mêran tenê ye. Ji dîrokê ve jin ji bo xwedîkirina zarokên xwe, afirandina dermanan û birêvbirina civakê kar û xebatê dike. Di jiyana gundan de jin xwedî rolek çalak e. Emê bi kar û xebatê pêşiya birçîbûn û belengaziyê bigirin."

### 'Jİ BO ALÎKARİYA CÎRANA XWE KAR DİKİM'

Xeyriyayê bal kişand ser amadekariya şînkayiyên demsalê re û wiha got: "Me şitilê bacanan çandine, herwiha me beqdenûs, xes û sîr jî çandine. Îro ez hatime alîkariya cîrana xwe da em giya ji nava sîran rakin û bidin sewalên xwe."
Xeyriyayê axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi kar û xebata çandiniyê em pêdiviyên xwe yên jiyanê peyda dikin her wiha em rê li pêşiya belengaziyê digirin."

# El-Eyûbî: Erdogan sûcên şer dike û ji bo neteweya Ereb xeter e

“Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan berpirsê belavbûna kuştin û wêrana li bakurê Sûriyê û Lîbyayê ye.”



Serokê Navenda Ereb a Karûbarên Stratejîk a Qudisê şêwirmend Zeyd El-Eyûbî, li ser destwerdana Tirkiyê ya li welatên Rojhilata Navî ev nirxandin kir: “Tevayiya raporên istixbaratî yên hatîn belavkirin, nişan didin ku Erdogan Tirkiye kiriye cihê perwerdekirina terorsîtan û şandina wan ya bakurê Sûriyê û Lîbyayê. Bi taybetî alîgirên koma Ixwan Mûslimîn. Ew çekdar di baregehên leşkerî yên girêdayî artêşa Tirk de perwerdeya leşkerî dibînin. Pişt re Erdogan derbasbûna wan ya bakurê Sûriyê û Lîbyayê hêsan dike.
El-Eyûbî diyar kir ku Erdogan dixwaze riya komên terorîst li welatên Ereb dagîrkeriya Osmanî vejîne. Ev siyaseta wî gefê li ewleyiya neteweya Ereb dixwe. Ji ber wê divê Ereb bi yek helwestê li hemberî wî bisekinin.
El-Eyûbî axaftina xwe wiha domand: “Erdogan û koma Ixwan Mûslimîn li dijî Kurdan li Sûriyê sûcên şer kirin. Erdogan sûcdarekî şer ê bixeter e. Ji ber sûcên hovane yên li djî zarok, jin û sivîlan were darizandin.
Şêwirmend El-Eyûbî bang li tevayiya dewletên Ereb kir ku li dijî polîtîka Erdogan helwesteke leşkerî û siyasî nîşan bidin da neteweya Ereb û rûmeta wê biparêzin.

## HDP’ê desteserkirina şaredariyan şermezar kir

HDP’ê desteserkirin û dagîrkirina şaredariyan şermezar kir û bang li gel kir ku li pace û şaneşînan her roj saet 20:00 çalakiya protestoyî bikin.
Desteya Rêveberiya Navendî ya HDP’ê têkildarî desteserkirina şaredariyan û operasyonên qirkirina siyasî daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de hat gotin, “Em vê hewldana namerdane şermezar dikin ku di demekê de ku dinya li dijî neweşiyê têdikoşe, dijminatî li Kurdan tê kirin.”
HDP’ê bang li gel, hêzên ked û demokrasiyê kir ku ji îro û pêve her roj saet 20:00 li pace û şaneşînên xwe çalakiya şermezarkirinê bikin.
Îro serê sibê pêlîsên dewleta Tirk bi ser şaredariya bajarê Êlihê û şaredariyên navçeya Erxenî, Licê û Farqînê yên Amedê de girtibûn û dest danîbûn serê. Herwisa hevserok jî destegîr kiribûn.

## QSD mîsogeriya Sûriyeke azad û pirreng e’

Bi pêmana salvegera binxistina DAIŞ’ê ji aliyê leşkerî ve, QSD’ê daxuyaniyek weşand û diyar kir ku destpêkirina pêvajoya siyasî li Sûriyê wek fîşeka dawî ye ku li termê DAIŞ’ê bikeve. Herwiha wê derî li ber aramiyê ji bo herêmên rizgarkirî vebe û QSD mîsogeriya Sûriyeke azad û pirreng e.

Di daxuyaniya QSD’ê de wiha hat gotin:
“Bi navê Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk, em îro serkeftina herî mezin pîroz dikin, ku me ji ber tevayiya cîhanê ve pêk aniye û tevayiya xaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji DAIŞê rizgar kiriye. Îro, bi derbasbûna salekê di ser bidawîkirina xîlafeta sexte re, DAIŞ hê cihekî metirsîdar digire ku em nikarin bi sistayî li hember bisekinin. Di heman demê de, dûrxistina nûnerên herêmê ji guftûgoyên navdewletî dihêle metirsiya vegera DAIŞ’ê hebe. Rêxistina ku hê di milê aborî de xurt e û karî bi derfetên xwe sûdê ji qonaxên tevlihev bigire û ji nû ve ruh bi xwe ve bîne. Ji ber wê destpêkirina pêvajoya siyasî li Sûriyê wek fîşeka dawî li termê DAIŞ’ê dikeve û her wiha derî li ber aramiya herdemî ji bo herêmên rizgarkirî û QSD bibe mîsogera Sûriyeke azad û pirreng.”

## ‘Netewa demokratîk yekîtiya gelan ava dike’

Endamê Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Cuma Kalo got, “Fikrê neteweya demokratîk dijminiya ji aliye deshilatdaran ve di nava gelan de hatî çandin, tine dike.”



Endamê Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Cuma Kalo got, “Felsefeya neteweya demokratîk li ser bingeha şerê li dijî fikrê netewperest a desthilatdar a hewl dide gelên din kontrol bike, ava bû.”
Li ser projeya neteweya demokratîk a Rêber Abdullah Ocalan pêş xistî Kalo ev nirxandin kir: “Ji destpêka serdema 20an ve Rojhilata Navî di kirîzên mezin re derbas dibe. Dewleta netewperest wê demê mîna çareseriyê bû. Lê gelên di dirêjayiya dîrokê de li ser erdê xwe dijîn, berdêla wê dan. Bi zêdebûna fikrê çewisandinê yê dewleta netewperest û rêgeza şofînî re ya ku yek fikir, yek ziman û yek rengî ji xwe re dike bingeh, bedelê ku gel dide bilind bû. Têgeha dewleta netewperest hişt ku civak bi giştî hilweşe. Gelek çandên ku li ser vî erdî di dirêjayiya hezarê salan de diman qir dibin. Bûyerên li Sûriyê dibin berhemên dewleta netewperest e in.”
Kalo di dewama axaftina xwe de wiha got. “Dewletên tevlî şerê Sûriyê bûyîn, girîngiyê nadin çareseriyê. Tersê wê, dixwazin aloziyê bi rê ve bibin û berjewendiyên xwe li Sûriyê biparêzin..”
Kalo bal kişand ser aloziya li Sûriyê û wiha axivî: “Gelek dewletên tevlî aloziya Sûriyê bûyîn, pişta xwe dan fikrê taîfî yê destpêka aloziyê derketî. Ew dewlet ne şerê fikr tenê dikin, şerê dîrokê jî dikin. Wêrankirina cihên dîrokî, yên li Efrîn, Til Helef, Tedmur û kelaha Hisnê mînakên wê ne.”
Têkildarî peyama Rêber Abdullah Ocalan a dawî Kalo wiha got: “Peyama Rêber Abdullah Ocalan bi birayê xwe re şandî, banga hevgirtina gelên herêmê ji bo parastina yek-tiya Sûriyê ye. Her wiha vê şiyariyê dide: Eger dev ji hevgirtinê berdin wê bibe sedema parçebûna Sûriyê û paşrojeke ne diyar.”



# Divê biryarên Rêveberiya Xweser pêk werin

Meclisa Giştî ya PYD’ê bang li welatiyên li derve û li seranserê Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir ku ji bo xweparastina ji Koronavîrusê, biryarên Rêveberiya Xweser cidî bigirin û li gorî wan tev bigerin.




Li gorî biryarnameya Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo xweparastina ji vîrusa Korona (Covid-19) û pêşêgirtina li belavbûna vîrusê, qedexeya derketina derve li Bakur û Rojhilatê Sûriyê 6:00`ê sibeha 23ê Adarê dest pê kir.
Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) jî daxuyaniyeke nivîskî weşand û bang li gel kir ku li gorî perspektîfên Rêveberiya Xweser tev bigerin.
Daxuyanî wiha ye:
“Ji ber belavbûna vîrusa Korona, li piraniya welatên cîhanê jiyan rawestiyaye. Lewre ev vîrûs pir bi lez belav dibe, bi taybetî di tevgerên rojane de xeteke zêdetir çêdike. Piraniya dewletan siyasetên xwe yên hundir di ber çavan re derbas kirin û li sîstemeke ku belavbûna vê vîrusê asteng dike, digerin. Heta niha ti encamên berbiçav bi dest nexistine. Ev rewş me hemiyan bi berpirsiyarên pir girîng û cidî re rûbirû dihêle.
Wek Meclisa Giştî ya PYD`ê em bang li endam û alîgirên partiya xwe û tevyiya gelê xwe yê li derve û li hudir dikin ku ji bo xweparastina ji vîrusê li gorî biryarên Rêveberiya Xweser tev bigerin.
Em tenduristiyeke baş ji gelê xwe û tevayiya gelên cîhanê re dixwazin.”

## Li hemberî nexweşiyên vegirtinê pêwîstî bi tevgera bizanebûn heye



**Zekî BEDRAN**

Koronavirûs li dinyayê bi lez belav bû. Halê hazir rojeva dinyayê ya herî girîng korona û tedbîrên li hemberî wê ne. Ji ber ku tenduristiya gel elaqedar dike, paşguhkirin, yan sivikdîtin wê windayiyan pirtir bike. Bi qasî ku tê dîtin civaka Çînê dereng hat agahdarkirin. Wisa tê fêmkirin ku destpêkê veşartine. Îranê jî heman tişt kir. Ji ber wê windayiyên wan jî zêde çêbûn. Piştî ku civaka Çînê hat agahdarkirin û tedbîr hatin girtin, vîrûs ket binê kontrolê.
Wisa tê fêmkirin ku Ewropiyan jî derbarê tedbîran de hinekî dereng mane.
Bi taybetî li Îtalya mirî pir dibin. Li welatên weke Emerîka jî mirinê dest pê kir. Li dinyayê bi lez belav dibe. Gelak welatan sînorên xwe girtin. Derketina kolanan qedexe dikin. Çiqas tevger kêm bibe, çûnhatin çiqas kêm bibe, belavbûn jî wê ewqas kêm bibe.

Pisporên vê nexweşiyê bênavber daxuyaniyan didin. Digel tedbîran zanebûna civakê û hevkarî pir girîng e. Ev mijar ne karekî wisa ye ku bi hêviya hikumetan, bûrokrasiyê û nexweşxaneyan tenê ve bê hiştin. Bi sedhezaran bi vê nexweşiyê ketine û belavbûn dewam dike. Ji bo wê divê civak guhê xwe bide şiyariyan û bidisiplîn tevbigere. Paşguhkirin û sivikdîtin wê windayiyan pirtir bike.

Li herêmên weke Rojava derfet bisînor in. Kontrolkirina sînoran zor e. Derbasbûna ser sînoran re bi qaçaxî pir e. Sûriye di binê ambargoyê de ye. Weke din welat bi giranî hilweşiyaye. Gelek mirov li kampan û di çadiran de ne. Weke din gelek mirov xizan in û li derdoran bi cî bûne. Çûnhatina di navbera herêman de pir e. Ji bo tedbîrê Rêveberiya Xweser ji 23ê mehê ve qedexeya derketina derve ragihand. Dibe ku hin tedbîr jî dereng mabin. Li aliyê din rêveberiya Şamê û Rêveberiya Xweser ti planên hevbeş amade nekirine. Ka kî kîjan herêmê bi rê ve dibe, li gorî xwe tedbîran distînin û planan çêdikin.

Çawa ku tê dîtin xeter hevbeş e. Ji ber ku pirsgirêk biyolojîk e, li koka mirovan, sînorên wan û li rewşa wan ya aborî nanêre. Mirov tev di hedefê de ne. Ji ber wê pêwîstî bi parvekirina zanebûnê û tecrûbeyên hevbeş heye. Wisa tê fêmkirin ku di nava tedbîran de mijara herî girîng paqijî ye. Lê mirovên xizan pir in. Pêwîstî bi amûrên paqijiyê, ava paqij û xwarina sîstema parastinê xurt dike heye. Ji bo wê divê em giraniyê bidin hevkariya civakî.

Îranê diyar kiribû ku wê biryara valakirina girtîgehan bide. Hat gotin bi dehhezaran mirov hatine berdan. Girtî bin jî li hemberî jiyana mirovan dewlet berpirs e. Eger tedbîrên pêşîgirtina li nexwşiyê tinebin, dewlet nikare bêje bila di hundir de bimirin. Niha li Tirkiyê jî rewşa girtîgehan tê nîqaşkirin. Lê AKP û MHPê berê dixwestin kesên derdorê xwe berdin. Li ser bertekên partiyên din, pirsgirêk li paş xistibûn. Niha ji wan re firset derketiye. Dibêjin em kesên ji terorê di hundir de bernadin. Tê dîtin di nexwşiyê de jî ka çawa bi dijminî tevdigerin. Halbiku vîrûs cudabûnê nake. Welat û sînoran nas nake. Lê cudabûn û dijminiya AKP û MHPê ewqas kûr bûye ku derbarê nexweşiyê de jî dibêjin; yên ne ji me bin bila bimirin.

Li Tirkiyê girtîgeh tijî bûne û rê di wan de nemaye. Eger nexweşî bikeviyê wê bibe felaketeke pir mezin. Li Emerîka vîrûs ketiye girtîgehekê. Ji ber wê divê derdorên demokratîk, xizmên girtiyan û hêzên li derveyî hikumetê giraniya xwe bidin vê mijarê.

Wisa tê fêmkirin ku wê sîstema kapîtalîst bi berfirehî were nîqaşkirin. Dibe ku ev nîqaş kapîtalîzmê nesekinînin, lê wê were fêmkirin ku ne qedera civakan e jî. Bi milyonan mirov ji xweza û axê qut kirin û di bajaran de li ser hev kom kirin. Xwarina xwezayî nehiştin. Xwerek û xwarinên li mexazeyan tên firotin, pirê wan bi hormon in. Bidestxistina perayan ketiye pêşiya her tiştî. Wêrankirina xwezayê sînoran nas nake. Felaketeke ekolojîk heye. Li bajarên mezin gemara hewayê û ya qelebalixê weke kabûsê bi ser civakê de xwe berdide. Li şûna edalet, hevkarî, wijdan û parvekirinê, insan bûye gurê insan. Tiryak, xumar û xerabûna exlaq nirxên mirovayiyê tevan serûbin dikin.

Nikarin hesabê krîza aborî ya ji ber koronavîrûsê derketî û windabûnên çêbûyîn tem derînin. Bi gotineke din jiyan disekine. Trên, balafir, erebe êdî weke berê ne di nava tevgerê de ne. Bihayê petrolê bi lez dadikeve. Kargeh tên girtin. Ji ber ku ciyên kar jî girtî ne, bi milyonan mirov bêkar dimînin. Ka wê kîjan fîrma yan dewlet iflas bike, eger niha neyê zanîn jî, rewşa serberjêr e.

Encam; pirsgirêk pirsgirêka mirovayiyê ye. Berî her tiştî divê mirov guhê xwe bidin tenduristiya xwe, tedbîrên tên girtin girîng bibînin û li gorî wan tevbigerin. Berê em bêjin can. Ji bo wê divê derfet û hewldan hevbeş bibin û ji nû ve em li xurtkirina civakîbûna xwe binêrin.

## Zimanê me hebûna me ye



**Mihemed ŞAHÎN**

Kurdên Bakur û Rojhilat saleke din, bêyî perwerdehiya bi zimanê kurdî, bêyî xweprastina bi zimanê kurdî, bêyî nasnameya zimanê kurdî û bêyî hebûna statuya zimanê kurdî li paş xwe hişt.
Civaka kurd 21’ê reşemhê Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê, wekî her carê di bin zext, zor û qedexeyên li ser zimanê kurdî de pêşwazî kir. Ji ber wan zext û zordariyan ku civaka kurd 21’ê sibatê ji roja pîrozbahiyan zêdêtir wekî roja pêkanîna çalakî û aktîvîteyên li dijî zext û zordariyên ser ziman dibîne, wekî roja ku di asta herî jor de daxwaza zimanê xwe bike dibîne. Wekî her carê îsal jî bi çalakî û bernameyên cur bi cur hewl dide êş û jana dilê xwe ya sedan salan ragihîne hemû cîhanê.
Wekî ku tê zanîn her neteweyek xwedî zimanekî cuda ye, ango her neteweyek bi zimanê xwe heye. Neteweyeke bê ziman li ser erdnîgariya cîhanê tune ye. Ji ber tiştê ku netewebûnê pêk tîne ziman bi xwe ye. Heke ziman tine be, netewe jî tine ye. Ziman; ruh û giyanê neteweyê ye; felsefe û nexşerêya jiyanê û hîmê netewebûnê ye. Ji ber vê girîngiya ziman e ku dagirkerên Kurdistanê bi sedan sal in ji bo tinekirina zimanê kurdî çi ji destê wan hatiye kirine û dikin.
Dema ku ziman tinebe ne pêkan e ku mirov ji hev û din fêm bikin û bi hev re bijîn. Ji bo jiyaneke bi hev re ya mirovan, pêdivî bi ziman heye. Çawa ku ji bo bihevrebûna mirovan pêdivî bi ziman heye, wisa jî ji bo çêbûna civakan û neteweyan jî dîsa pêdivî bi ziman heye. Hemû taybetmendiyên neteweyî yên wekî orf û edet, nêrîna wê ya cîhanê, felsefeya wê ya jiyanê, baweriyên wê, hunera wê, kelepora wê ya dîrokî û hwd. hemû bi ziman pêk tên û di zimanê wê neteweyê de veşartî ne. Dema ku ziman nebe ev yek jî pêk nayên. Zimanê hevpar xezîneya hestên neteweyî ye. Kesên ku di navbera xwe de bi heman zimanî diaxivin di navbera wan de hestên hevpar û neteweyî pêk tên. Ev jî dibe sedema hevgirtin û yekitiyeke xurt.
Civak û mirov bi zimanê xwe hene. Dema ku ziman ji dest hat girtin hebûna wê ji destê wê tê girtin. Lewre pişaftina civakan bi ziman destpê dike. Dagirker di serî de êrîşî ziman dikin. Armanca wan a sereke bêrûmetkirina ziman e. Mirov û civakên ku ji ziman û çanda xwe dûr ketin ji hemû tiştên xwe dûr dikevin û êdî nikarin wekî xwe bijîn. Nikarin wekî serdestên xwe jî bijîn, dibin qopyaya yekî din, an jî neteweyeke din. Dibin koleyên serdestên xwe.
Neteweyên ku zimanê xwe neparêzin û rûmet nedin zimanê xwe dê nikaribin xwe ji bandora çand û zimanên din ên serdest biparêzin. Bi demê re dê bêhemdê xwe bibin dîlên çand û zimanên din. Piştî ku bûn dîlên çand û zimanên din, dê ji çand û zimanê xwe dûr bikevin û bibin biyaniyên civaka xwe. Kesên ku bû biyaniyê civaka xwe dibin biyaniyên xwe. Lê nabe kesên ji çanda serdest, dibin kesên bê esil û bê kok.
Kesên ku bê kok û bê reh man û bûn biyaniyên hêza xwe ya cewherî, rûmeta xwe ya keseyatî, nirx û pîvanên xwe yên exlaqî û civakî hemûyan wenda dikin. Dibin kesên bê rêz û bê nirx û dikevin bin bandora derûniya xwebiçûkdîtinê. Baweriya ji xwe wenda dikin. Xwe wekî kesên kêrnehatî û bêşexsiyet dibînin. Êdî ne bi kêrî xwe tên û ne jî bi kêrî kesên din tên. Di keseyata wan de koletiya ji dil dest pê dike. Ev yek qonaxa dawîn a pişaftinê ye. Piştî wê qonaxê pêvajoya xwepişaftinê (oto-asîmîlasyon) dest pê dike. Bi destpêka xwepişaftinê re têgehên wekî azadî, serxwebûn û têkoşînê di rojeva wan de namînin. Êdî pêdiviya wan bi van têgehan tine ye.
Heke mudaxale neyê kirin û pêşî li rizîna civakî neyê girtin piştî demekê ji çand û zimanê xwe rev û nefret dest pê dike. Bi hezkirineke mezin berê xwe didin çand û zimanê serdestên xwe. Hewl didin bibin parçeyeke civaka serdestên xwe û wekî wan bijîn.
Hewce ye em jibîr nekin ku asta zimanê neteweyekê asta çand û şaristaniya wê neteweyê nîşan dide. Netewe çiqas zimanê xwe biparêze û rûmetê bide zimanê xwe û zimanê xwe dewlemend bike, şaristaniya wê neteweyê jî ewqas xurt û geş dibe. Her wiha neteweyek çiqas li zimanê xwe xwedî dernekeve û zimanê xwe bêrûmet bike şaristaniya xwe û kesayeta xwe jî bêrûmet û bênirx dike.
Bi kurt û kurmancî, heke zimanê me hebe em ê jî hebin, heke zimanê me bi rûmet be em ê jî bi rûmet bin, heke zimanê me xurt be em ê jî xurt û serbilind bin.